**FACHSTELLE**
**FRÜHE KINDHEIT**
Postfach 1000
CH-8201 Schaffhausen
T +41 52 632 53 51
www.stadt-schaffhausen.ch
www.fk-stsh.ch

Fachstelle Frühe Kindheit

Schaffhausen, Nîsana 2026

**Encamên asta zimanê (Sprachstand) zarokên biçûk 2026**

Dêbavên hêja (Liebe Eltern),
Kesên miqatebûnê yên hêja (Liebe Bezugspersonen)

Destpêka îsal we beşdarî rapirsîna asta ziman (Sprachstanderhebung) kir. Ji bo vê yekê pir spas.

Gelek zarok bi çend zimanan (pirrzimanî/mehrsprachig) mezin dibin. Her zarokek bi leza xwe ya taybet fêrî zimanan dibe.

Rapirsîna asta ziman (Sprachstanderhebung) nîşan dide ku zarokê we niha çiqasî baş fêm dike û bi Almanî diaxive.
Ji bo fêrbûna Almanî, zêdetir têkiliya bi zimanê Almanî re girîng e.

Ji ber vê yekê em pêşniyar dikin ku zarokê we bi rêkûpêk biçe koma lîstinê (Spielgruppe) an jî navenda lêmiqatebûna rojane ya zarokan (Kindertagesstätte/Kita).

Gelo zarokê we berê diçe koma lîstinê (Spielgruppe) an navenda lêmiqatebûna rojane ya zarokan (Kindertagesstätte)?
Heke wisa be, em pêşniyar dikin ku zarokê we li wir bêtir dem derbas bike.

Baş e ku zarokê we herî kêm heftiyê du caran biçe koma lîstinê (Spielgruppe) an jî navenda lêmiqatebûna rojane ya zarokan (Kindertagesstätte).
Bi vî rengî destpêkirina zarokxaneyê (Kindergarten) dê hêsantir bibe.

Em lîsteya komên lîstinê (Spielgruppen) û navendên lêmiqatebûna rojane ya zarokan (Kindertagesstätten) li bajarê Schaffhausenê ji bo we dişînin.

Pirsên we hene an ji bo qeydkirinê alîkarî ji we re pêwîst e?
Hingê bi me re têkiliyê deynin. Em bi kêfxweşî alîkariya we dikin.

Di malpera me de **https://fk-stsh.ch** hûn dikarin agahiyên bêtir li ser geşatiya ziman (Sprachentwicklung) û her weha xizmetên ji bo zarokên biçûk û malbatan bibînin.

Bi silavên germ

Mirjam Vock
Fachspezialistin Familien
Tel. +41 52 632 53 63
Mirjam.Vock@stsh.ch